Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1052 | 29-Adar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | nameronahi@gmail.com | ☎ 423165

# Çîroka vegerandinê ya ji daran heta kaxezê, ji kaxezê heta lewheyan


**Nivîskara Xezayê Huda Thabet ji kaxezên li mala xwe sûd girt û bi hilberandinê ji bo çand û hunerê bi projeya 'Okid' hewil dide ji bo hawirdorê hişmendiyê bide avakirin.**

Ji bo parastina hawirdor, di roja me de tişta ku herî baş were kirin yek jê madeyên avêtin yên ku tên vegerandin e. Kaxezên ku di jiyana rojane di her qadê de tê bikaranîn, bi vegerandinê car din tê halê bikaranînê û ev li gora madeyên din yê avêtinê hêsantir e. Jiyana nivîskar Huda Thabet di nava kaxezan de derbaz dibe. Bi kaxezên ku li mala wê kombûne projeya vegarenadinê pêşxistiye. Nivîskar di çarçoveya projeya ji bo çand û hunerê navê 'Okid' dayê

Huda Thabet destnîşan kir ku di çarçoveya ji bo çand û hunerê pirojeya 'Okid' ava kiriye û yên ku berhem bi karanîne dibêjin lewha ji amurên din zêdetir bi qaliteye. Huda Thabet bi bîr xist ku dema ku hîn zêdetir pêwîstiya wê bi kaxezan çêbû li sazî û cihên kar digere û kaxezan kom dike.

**'Wê projeya me birîna daran kêm bike'**

Huda Thabet da zanîn ku bi belavbûna vegrandinê re ji bo hiberîna kaxezan wê hêjmara birîna daran kêm bibe û wê ziyanên ku digihin xwezayê kêm bibe û divê piştgiriya pirojeyên bi vî awayî



hem hewil dide hişmendiyê ava bike û hem jî hewirdorê biparêze.

**'Mala min tijî kaxez bûbû'**

Huda Thabet ku perwerdeya nivîsandina çîrokan dide zarokan diyar kir ku ev fikir bi çîrokên zarokan û di malde tejîbûna kaxezan çêbû û wiha got: "Mala min tejî kaxez bûbû, ji bo ew kaxwaz ziyanê nede hawirdor min ne xist çopê û ji ber vê jî min dest bi lêkolînê kir û min vegerandin nas kir. Ji bo ez vegerînim jiyanê min dest bi xebatan kir."

Huda Thabet di çarçoveya pirojeya kaxezan de, lewheyan ji bo kesên ku bi hunerên ciwan re mijul dibe çêdike û piştre van lewheyan dibe ji xwendekarên xwere û ew qaliteya wan erê dikin. Huda Thabet da zanîn ku dema ku ji vê pirojeyê dahata aborî bi dest xist bi 4 jinan re atolyeya xwe vekir.

werin kirin. Dema ku me ji nîvîskar pirskir karê vegrandinê bi bi kijan qonaxan tê encaman û wiha behsa qonaxa xebatên xwe kir û got: "Destpêkê beriya ku em kaxezan bixin testek mezin ya avê de em qet dikin û piştre em herî kêm 4 saetan germ diki, ji bo zêdekirina kaliteya berhemê hinek malzeme em dixinê. Miktara kaxezaê ji çaran sêyê wê em di muxelên dest de derbaz dikin û cardin şil dikin. Piştî demekê kaxez divegere hevirê ku bi awayek asan şekil bigre. Qonaxa piştî wê qonaxa zuhakirinê ye. Lewhayên ku çêbûne li ber rojê em zuha dikin. Piştî ku zuha dibin lewha di qonxaên zimpakirinê re derbaz dibin û herî dawî jî em dipêçin û ji bo karanînê amade dibe."

Huda Thabet herî dawî diyarkir ku dixwaze pirojeya xwe mezin bike û bang li jinan kir ku piştgiryê bidin. **JÎNHA**

# KESK'ê serdana fitariya malbata Şenyaşarê kir

**Malbata Şenyaşarê di çalakiya xwe ya nobeda edaletê de, fitariya xwe li ber edliyeyê kir. KESK û saziyên girêdayî wê jî serdana nobeda edaletê ya malbata Şenyaşar kirin û bi hev re fitara xwe kirin.**



Xizm û parazvanên Parlamenterê AKP'ê yê Rihayê Îbrahîm Halîl Yildiz di 14'ê Hezîrana 2018'an de li navçeya Pirsûs a Rihayê êrişî Malbata Şenyaşar kiribûn. Di encama êrişê de hevjînê Emîne Şenyaşarê û du kurên wê hatibûn qetilkirin. Li ser vê yekê Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar di 9'ê Adara 2021'ê de li pêşiya Edliyeya Rihayê dest bi çalakiya Nobeta Edaletê kiribûn. Çalakiya Malbata Şenyaşarê di roja 735'an de berdewam dike.

Emîne Şenyaşar û Ferît Şenyaşar çalakiya xwe heya wextê fitarê domandin. Sendikayên girêdayî Konfederasyona Sendîkayên Karkerên Cameweriyê (KESK) ên Rihayê serdana Nobeda Edaletê ya malbata Şenyaşarê kirin û bi hev re fitara xwe kirin.

**'Em ê piştevaniya malbata Şenyaşarê bikin'**

Di serdanê de Hevserokê şaxên KESK'ê Mahmût Bînîcî axivî. Bînîcî diyar kir ku têkoşina edaletê ya malbata Şenyaşarê dê rojekê encam bigre û wiha got: "Em bi hêvî ne ku pêkhatina edaletê jî nêz e. Em ê bi piştevaniyê ji heq van rojên biêş derkevin û piştgiriya têkoşîna edaletê ya malbata Şenyaşarê bikin. Em ê bi hev re vê bê edaletiyê derbas bikin. Ji bo siberijê bûyereke wiha çênebe, em vê têkoşîna malbatê pîroz dikin û ji bo wan doza edaletê dikin."

Ferît Şenyaşar jî ji bo serdanê spasiya KESK'ê kir û got: "Me ji bo edaletê daxwaz ji desthilatê jî kir, lê pêk nehat. Lê em bawerin ku ger desthilat biguhere dê edalet pêk were." **MA**

Sudoku: Bersiv 61

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 8 | 3 | 5 | 7 | 4 | 1 | 6 | 9 |
| 6 | 4 | 7 | 9 | 8 | 1 | 3 | 2 | 5 |
| 5 | 1 | 9 | 2 | 6 | 3 | 8 | 4 | 7 |
| 8 | 2 | 5 | 7 | 3 | 9 | 4 | 1 | 6 |
| 9 | 6 | 4 | 1 | 2 | 5 | 7 | 3 | 8 |
| 7 | 3 | 1 | 8 | 4 | 6 | 5 | 9 | 2 |
| 3 | 9 | 6 | 4 | 5 | 8 | 2 | 7 | 1 |
| 1 | 5 | 2 | 3 | 9 | 7 | 6 | 8 | 4 |
| 4 | 7 | 8 | 6 | 1 | 2 | 9 | 5 | 3 |

Sudoku:Pirs 62

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | 3 | | 4 | 9 | |
| | | | | | | | 1 | |
| 7 | 6 | | | | 9 | | | 2 |
| | 5 | 4 | | | 1 | | | 9 |
| 8 | 9 | | 6 | 2 | 5 | | 4 | 1 |
| 2 | | | 8 | | | 6 | 5 | |
| 5 | | | 9 | | | | 2 | 8 |
| | 2 | | | | | | | |
| | 1 | 3 | | 6 | | | | |

## Quncika Têgînan

| Binpêkirin | Guhnedana qanûnan, yan jî bendên lihevkirinê. |
|---|---|
| Hevrê | Kesên ji bo têkoşînekê, ji bo pêkanîna fikrekî hevaltiya hev dikin. |
| Hempîşe | Kesên xwediyên heman karî: Wezîrê Çandê yê Çînê bi hempîşeyê xwe yê Amerîkî re rûnişt. |
| Hemser | Jin û mêrên hev. Hevalên hev yên jiyanê. |
| Hevsengî | Belavkirina selahiyeta hêzên siyasî, bi awayekî ku hev sînordar bikin: Berê Yekîtiya Sovyetan û Amerîka hebûn, hevsengiya dinyayê niha hatiye guhertin. |
| Hemşîre | 1. Kesên bi şîrekî mezin bûyîn. 2. Xwîşk. 3. Jinên li nexweşxaneyan li nexweşan dinêrin. |
| Pêşeng | Kesê nûnertiya hina dike; rêber, rêveber. |
| Pêşniyar | Ji bo çaresrkirina pirsgirêkekê diyarkirina fikrekî, teklif. |
| Pêşwazî | Rûmetdayîna ji bo kesekî ji derve tê: Mêvanên xwe li ber derî pêşwazî kirin. |
| Polîtîka (Îtalî) | Diyarkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan. Siyaset. |




# Newroz Ehmed: QSD'ê ji bo tevahiya Sûriyeyê û gelan têdikoşe

Newroz Ahmed diyar kir ku QSD'ê ji bo tevahiya Sûriyeyê û gelan têdikoşe û got, yek ji wezîfeyên QSD'ê yên sereke rizgarkirina herêmên dagirkirî ye.R-2

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1052 | 29-Adar- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# BESÊ HOZAT: DÎNAMÎKA DEMOKRASIYA BINGEHÎN TIFAQA KED Û AZADIYÊ YE

Besê Hozat diyar kir ku Tirkiye rastî pêvajoyeke hilbijartinê ya dîrokî hatiye û got, di vê pêvajoya têkoşînê de rola Tifaqa Ked û Azadiyê bi taybetî di vê pêvajoya hilbijartinê de pir girîng e. Ev tifaq wê ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê jî roleke diyarker bilîze.R-4



## PKK: Em ê teqez xwedî li armancê fermandarê mezin Fazil derkevin

Komîteya Navendî ya PKK'ê şehadeta fermandarê mezin Fazil Botan ragehand û got, em soz didin ku em ê teqez xwedî li armancên Fermandarê mezin Fazil derkevin.R-3

## 'Serhildana ku Jîna Emînî dest pê kir, em ê dewam bkin'

Xwendekar û mamosteyên jin yên Zanîngeha Rojava, tundiya li dijî serhildana jinan ya li Rojhilatê Kurdistan û Îranê şermezar kirin û gotin, Serhildana ku Jîna Emînî dest pê kir em ê berdewam bikin.R-5

## 6'mîn Mîhrîcana Şehîd Yekta Herekol dest pê kir



Li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya abajarê Qamişlo, 6'emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Şehîd Yekta Herekol dest pê kir. R-7

## Zanîngeha Rojava Newroza 2023'an pîroz kir



Xwendekar û mamosteyên Zanîngeha Rojava bi diruşmeya 'Her der Newroz, her dem azadî' bi şahiyek Newroza 2023'an pîroz kirin.R-3

## Xwarin û şerbetên meha Remezanê.R-6

Nêzîkbûna Erebîstana Si'ûdî û Sûriyê
Zekî Bedran R-5



ÇIMA SEMBOLÊN PDK'Ê LI EFRÎNÊ LIBA DIKIN?
DILYAR CIZÎRÎ R-4

# Newroz Ehmed: QSD'ê ji bo tevahiya Sûriyeyê û gelan têdikoşe

Newroz Ahmed diyar kir ku QSD'ê ji bo tevahiya Sûriyeyê û gelan têdikoşe û got, yek ji wezîfeyên QSD'ê yên sereke rizgarkirina herêmên dagirkirî ye.

Navenda Nûçeyan

Endama Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) Newroz Ehmed derbarê salvegera 4'an a serketina li Baxozê, têkoşîna nû ya li dijî DAÎŞ'ê û encamên wê ji Ajansa ANF'ê re axivî.

Newroz Ahmed diyar kir ku tevî bi Baxozê re çeteyên DAIŞ'ê têkçûn, lê fikira DAIŞ'ê hîn heye û wiha domand: "Şaneyên razayî yên DAÎŞ'ê li herêmê hîn jî hene. Piştî Baxozê ketin nava sivîlan û xwe veşartin. Her wiha alîgirên wan jî hebûn. Ji ber vê me diyar kiribû ku operasyonên li hemberî şaneyên veşartî yên DAÎŞ'ê wê dewam bikin. Di vê çarçoveyê de jî gelek serketinên mezin hatin bidestxistin. Piştî Baxozê gelek serçete hatin girtin ku şane bi rê ve dibirin û operasyonên me hîn jî dewam dikin."

Newroz Ehmed derbarê operasyonên li hemberî şaneyên DAIŞ'ê wiha got: "Ji Baxozê û vir ve têkoşîna me qet nesekinî û bi rêbazên cuda dewam kir. Di nava van salan de bîlançoya têkoşîna me vê yekê radixe pêş çavan. Xetere hîn bi dawî nebûye, DAÎŞ hewl dide li herêmê xwe ji nû ve bi rêxistin bike, êrîşên girtî û malbatên DAÎŞ'î têne birêxistinkirin. Ji bo kontrola van herêman kar û têkoşîneke mezin tê kirin. Bi pêşengiya hêzên me yên îstîxbaratê QSD û Hêzên Ewlekariya Hundirîn têkoşîneke hevpar dimeşînin."

Newroz da zanîn ku li gorî agahiyên îstîxbaratê yên ketin destê wan, wan li dijî rêxistiniya DAÎŞ'ê li Kampa Holê, Til Berak, Til Hemîs, Reqa, Dêrazor, Tebqa, Sirîn û gelek herêmên din bi dehan operasyon hatin kirin û wiha domand: "Bi taybetî piştî êrîşên li ser Serêkaniyê û Girê Spî, mîna êrîşên li ser Girtîgehên Reqa û Sînaa ya Hesekê çeteyên DAÎŞ'ê gelek êrîşên mezin li herêmê kirin. Di vê demê de DAÎŞ'ê 352 êrîşên terorî kir. Di encama operasyonan de yên bi Koalîsyona Navneteweyî û Hêzên Ewlekariya Hundirîn re hatin kirin, 397 jê mirî 2323 çete hatin bidestxistin. Lêpirsîna çeteyên hatine girtin hîn jî dewam dike."

Newroz Ehmed ragihand ku çeteyên li Baxozê hatin girtin hîn jî li gel wanin wiha got: "Ji 60



welatî girtî hene. Li ser agahiyên têkildarî hewldanên ji bo revandina çeteyên DAÎŞ'ê yên girtî û jinûve birêxistinkirina DAÎŞ'ê di sala 2023'an gelek operasyonên girîng hatin kirin. Barê herî giran ê li ser milê me QSD û Rêveberiya Xweser, DAÎŞ'iyên girtî ne. Ji ber ku girtîgehên li herêmê mîna berê xurt nîne û di rewşa heyî de girtî li herêmê hatine belavkirin. Lêçûnên ji ber tenduristî, kinc, ewlekarî û hwd. ên DAÎŞ'iyên girtî ji me re hatine hiştin. Koalîsyona navneteweyî ya li dijî DAÎŞ'ê tenê ji sedî 10 ê vî barî radike, yên din hemû ji me re hatine hiştin. Saziyên navneteweyî bi taybetî piştî êrîşa li ser Girtîgeha Sînaayê hatibin herêmê jî piştgiriya wan a heyî gelekî kêm e."

Nerwroz Ahmed da xuyakirin ku divê her welat welatiyên xwe bibin welatê xwe û wiha domand: "Darizandina çeteyên DAÎŞ'ê li herêmê karekî hêsan nîne, divê dadgeheke navneteweyî bê avakirin. Lê belê di vê mijarê de gavek nehate avêtin. Piraniya DAÎŞ'iyên girtî û malbatên wan ji Iraqê ne. Ji bo şandina DAÎŞ'iyan bi hikumeta Iraqê re danûstandin hatin kirin, lê belê ev kar gelekî giran dimeşe. Li gorî rewşa herêma me ev girtî barekî giran e. Ji ber ku herêma me timî bi balafiran û topan tê bombekirin. Em vî barê girtiyan bi tena serê xwe nikarin rakin. Ji bo tevahiya cîhanê metirsiyek"

Newroz Ehmed bal kişand ser astengiya dewleta Tirk a li pêşiya têkoşîna li dijî çeteyên DAIŞ'ê û wiha got: ."Serçetyê DAÎŞ'ê Ebûbekir Bagdadî li ser sînorê Tirkiyeyê li herêmeke di bin kontrola Tirkiyeyê de hate kuştin. Her kes bi hevkariya dewleta Tirk a bi DAÎŞ'ê re zane. Çeteyên ku me ew girtin, di lêpirsînê de mikur hatin ku li Tirkiyeyê hatine perwerdekirin û ji aliyê îstîxbarata Tirk ve hatine şandin. Fermana xwe ji dewleta Tirk werdigirin. Eşkere ye ku li herêmên dagirkirî, çeteyên DAÎŞ'ê bi navên cuda tevdigerin".

Newroz Ahmed da xuyakirin ku li herêmên dagirkirî bûyerên revandinê, kuştinê li hemberî civakê dikin. Kiryarên li dijî jinan dikin ji yên fikrê DAÎŞ'ê cuda nînin. QSD ji bo tevahiya Sûriyeyê û gelan têdikoşe, lewma yek ji wezîfeyên xwe yên sereke rizgarkirina herêmên dagirkirî ye. Ji bo herêmên dagirkirî bêne rizgarkirin û gelê me karibe bi hêsanî li xaka xwe vegere karên leşkerî jî di nav de ji gelek aliyan ve karê me dewam dikin."

# ' Aboriya jinê gav bi gav pêş dikeve'

Norşîn Sîno \Qamişlo

**Xwaringeha Lîtî ya jinê ku ji bo pêşxistina aboriya jinê li bajarê Qamişlo hatibû vekirin, gavên girîng avêtin. Jinên karker yên xwaringehê diyar kirin ku ew hewil bidin di demên pêş de karê xwe firehtir bikin û aboriya jinê pêş bixin.**

Piştî şoreşa Rojava jin di tevahiya aliyan de pêş ket û bû xwedî kesayeteke serbixwe. Bi serpiriştiya Kongra Star û tevgerên jinan, ji bo pêşxistina aboriya jina gelek projeyên jinana pêş ketin. Herwiha ji bo jinan kargeh, xwarngeh, firin, markêt û projeyên çandiniyê hatin vekirin.

Yek ji projeyên pêşxistina abaoriya jinê jî, vekirina Xwaringeha Lîtî ya jinan li bajarê Qamişlo bû. Ev xwaringeh ji aliyê Meclisa Jinê ya Şaredariya bajarê Qamişlo ve hate vekirin û armanca wê peydakirina derfetên kar ji bo jinan û pêşxistina aboriya jinê bû.

Di xwaringehê de 10 jin kar dikin, her jinek karê wê cuda ye, hin xwarinê çêdikin, hin pêşwaziya mêvanan dikin û hin jî paqijiyê dikin. Xwaringeh xwarinên Rojhilatî yên wekî 'kutilk , pelên reza , saciyê





…û hwd pêşkêş dikin.

Derbarê xwarngeha Lîtî de jinên karker yên xwaringehê û welatiyên bajarê Qamişlo ji me re axivîn.

Jina bi navê Maryem Ibrahîm ku ji bajarê Qamişlo ye û di xwaringehê de kar dike derbarê xwarngeha jinê de wiha got: "Armanca me ji vekirina xwaringehê pêşxistina aboriya jinê ye, herwiha guhertina nerînên civakê yên paşverû yen li ser jinê û bi taybet di civaka ereb de. Di civaka ereb de jin nabe ku kar bike û kesayeta xwe ava bike. Me bi vekirina xwearngehê xwest ku ji civakê re bêjin ku jin di her aliyan de dikare pêşengiyê bike û bi ser bikeve. Piştî şoreşa Rojava aboriya jinê gav bi gav pêş dikeve"

Meryem da xuyakirin ku ew bi xwe pêdiviyên xwaringehê peyda dikin û wiha domand: "Her sibeh em diçin bazarê û pêdiviyên rojane yên ku hewcedariya xwaringehê bi wan heyê amade dikin. Em tenê




di vegera malê ya derngî şevê de astengiyê dibînin, ji ber ku civak vê yekê qebûl nake. Ji bilî wê çi pirsgirêk li mpêşiya me derdikeve em çareser dikin."

Meryem Ibrahîm diyar kir ku ji bo pêşxistina xwaringehê hêviyê wê pir mezinin û axaftina xwe wiha qedand: "Hêviyên me hene ku em salona xwaringehê firehtir bikin û cûreyên xwarnên Rojhilatî yên ku tên hezkirin zêde bikin, herwiha jimara karkerên xwaringehê jî zêde bikin."

Welatiyê bi navê Basil El Meter yê ji bajarê Qamişlo ku her dem ji bo xwarinê serdana xwaringehê dike, derbarê xwaringehê de wiha got: "Li vê xwaringehê xwarin ne bi rengê xwarina ku xwaringehên din pêşkêş dikin , xwarina ku jin amade dikin nabe wekî ya ku bi destê mêran tê amade kirin."

Welatiyê bi navê Basil Al Meter sekeftin ji jinan re xwest û axaftina xwe wiha qedand: "Ez bi hêvî me hê bêhtir xwaringeh pêşbikeve û serkeftinê ji wan re dixwazim. Divê jin di tevahiya aliyan de bibe pêşeng û mafê xwe bi navê ol û civakê jê hatiye standin, bê bidestxistin."



# 6'mîn Mîhrîcana Şehîd Yekta Herekol dest pê kir

Li Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya abajarê Qamişlo, 6'emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Şehîd Yekta Herekol dest pê kir.

Navenda Nûçeyan

Li navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo, bi dirûşma 'Şano derbirîna mûzaîka gelan e', 6`emîn Mîhrîcana Şanoyê ya Şehîd Yekta Herekol dest pê kir. Di mihrecanê de hunermend, nivîskar, şanoger, endamên saziyên Rêveberiya Xwesr, Nûnerên partiyên siyasî û nûnerên tevgerên jinan amade bûn.

Axaftina destpêkê ya mîhrîcanê ji aliyê cîgira hevserokatiya Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê Maryana Zekî Aho ve dest pê kir.

Maryana bi xêrhatina beşdaran kir û li ser girîngiya şanoyê wiha got: "Şano wijdan û neynika civakî



ye. Her wiha roleke girîng di çareserkirina pirsgirêkên civakê de dilîze."

Maryana anî ziman ku têkoşer Yekta Herekol bi çalakiya xwe wateyeke nû da şanoyê û kir hunerek ku bi vîna gelan têkel be.

Endamê Komîteya Amadekar a Mîhrîcanê Xelîl Tehlo jî axivî û got, dirûşma mîhrîcana 6`an a Şehîd Yekta Herekol pirrengiya çandî ya li herêmê nîşan dide û diyar kir ku di mîhrîcana îsal de beşdarbûnek ji Başûr û Rojhilatê Kurdistanê jî heye.

Xelîl Tehlo bi boneya hefteya lehengiyê jî şehîd Mazlûm Dogan û Mahsûm Korkmaz bi bîr anîn. Her wiha mîhrîcan li Rêber Abdullah Ocalan û hemû şehîdên azadiyê pîroz kir.

Piştre sînevîzyoneke li ser jiyana şehîd Yekta Herokol hat pêşandan.

Piştre jî şanoya bi navê Kevir a Koma Renîm a girêdayî navenda Mihemed Şêx hat pêşandan.

Nivîskarê şanoyê Feysel Xelel û Riyad Îsmet e û derhênerê wê





Kamîran Caro ye.

Di şanoyê de 3 şangor rola jin, mêrê desthildar û hunermend dilîzin. Şano balê dikişîne ser kevirekî ku sembola berhemên fikirî yên mirovan e. Her wiha îşaretê bi hewldanên hêzên desthilatdar ên bi rêbazên leşkerî, bi pere û jinan ên ji bo bidestxistina vî kevirî. Lê ruxmî hemû hewldanan leşkerî yên hêzên desthildar, peykersazê ku kevir çêkiriye, kevir diparêze û bi ser dikeve.



Hêjayî bibîrxistinê ye ku Mihrîcana Şehîd Yekta Herekol, her sal di 27'ê Adarê ku roja Şano ya cîhanî ye, li Navenda Çand û Hunerê ya bajarê Qamişlo tê lidarxistin û gelek komên şanoyê ji hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tê de beşdar dibin û di dawiyê xelat tên belavkirin. Mîhrecana ku di 27'Adarê de dest pê dike di 2'ê Nîsanê de bi dawî dibe.

# 'Divê jin ji derveyî rola civakê lê sepandî deng û rengê xwe derxîne'

**Endama Koma Çirîke ya Sine Şadî Xulamî anî ziman ku divê jin ji derveyî kar û rola civakê li ser sepandî bikare deng û rengê xwe û kêrhatiyên xwe derxîne holê.**

Koma Çirîke ya Sine ku xwedî huner û çêkerekî hunerî ya resen a bajarê Sine ya Rojhilatê Kurdistanê bi karê hunerî radibe, diyar dike ku ew dixwazin deng û rengê hunera resen a Sine bi Koma Çirîke bigihîne tevahiya Kurdistan û cîhanê.

Ji komê Şadî Xulamî hem dengbêj û hem jî di nava koma Çirîke de li defê dixe û nêzî 15 sal in bi karê hunerê ve mijûl e. Xulamî anî ziman ku çend kesek in ji bajarê Sine yê Rojhilatê Kurdistanê ku xwedî kêrhatiyeke baş a karê hunerê ne li hev kom bûne û komek avakirine.

Şadiye Xulamî destnîşan kir ku a rastî ev kom komeke ya jinan e û got: "Vê carê ji bo pîrozbahiyê em tevlîhev hatin Başûrê Kurdistanê. Em dixwazin kêrhatî û jêhatîbûna jinê di warê hûnerê de bidin nîşandan."



**Huner ji nava malê hil tê**

Dengbêj Şadî Xulamî bal kişand ser karê hunerê yê li bajarê Sîne û dibêje ku Sîne xwedî hunerke taybet a mûzîkê ye û wiha domand: "Huner li Sîne vejiya ye. Li hemû malan huner heye. Ti malek nîne ku tebûr û hunermedek nebe. Em jî her yek ji malbatekê ne, xwedî zarok û malbatin. Li gorî derfet û kêrhatiyên xwe karê mûzîkê didomînin. Bi vî rengî rengeke cuda ya jinê derxînin pêş çavan. Wê newekheviya ku di nava civakê de jin û mêr cuda dike, hewl daye kêm bikin. Ji holê rakin."

**Yekem karê hunerê ya koma jinan**

Xulamî li ser navê komê ya 'Çirîke' û xebatên wê jî ev anî ziman: "Koma Çirîke ya Sine bi pêşengtiya Xatûn Şermîn Zernêşan ku yek ji wan kesayetane xwedî behreyeke baş û ji destpêkê ve yekem kesek ku karê hunerî ya koma jinan li Sine daye avakirine. Niha koma me ji gelek bajarên cihê kes tevlî kiriye û bûye komeke berfireh û xwedî ciheke taybet e. Koma me Çirîke gelek li Rojhilat li, Mukriyan li Tehran û heta Amed, Stenbol û Gurcistan jî konsert lidar xistine.

**Çirîka wate dengê bilind her kes bibhîze**

Koma Çirîke ya Sine xwedî wateyeke taybet e. Çirîke tê wateya deng. Dengek bilind û zîq be, tê wateya Çirîke. Tê wateya dengek cêwaz ji dengên din. Dengeke wisa ye ku kes nîne nebihîse. Ji bo wê me kir Çirîke ya Sine ku dengê Sine bigihêje her derê.

Li Sine gelek navendên me yên hûnerî hene. Hemû endamên Çirîke ya Sine mamoste ne û her yekê li navendekê karê hunerî dike û mamosteyatî dike. Xwedî xwendekar û gelek kes perwerde kirine. Roj bi roj endamên nû û kêrhatî li xwe zêde dike. Fêrî hunera resen a herêmî dibe. Hewl didin ku mûzîk û çandên modernîte tevlî çanda resen a Kurdî nebe û biparêze."

**'Divê jin li gel erk û rolê civakê lê sepandî, bikarê cêwaz deng û rengê xwe derxe'**

Herî dawî dengbêj Xadî Xulamî bang li hunermendên jin kir û ev got: "Hêvî û daxwaza min ew e ji jinan, ji derveyî kar û jiyana ku civakê li ser sepandî, li gel wê xwedî rol û kareke cuda be ku bikare rengê xwe derxîne holê. Dengê xwe, kêrhatiyên xwe derxîne derve." **ANF**

# Xwarin û şerbetên meha Remezanê

Li bajarê Qamişlo, welatî di meha Remezanê de berê xwe didin xwarin û şerbetên ku bi taybet di meha remezanê de tên çêkirin. Çêker û firoşkarên xwarin û şerbetên remezanê jî diyar kirin ku ev xwarin û şerbet ji bo meha remezanê bûne kevneşopî û ji ber ku bûhayên wan kêmin, zêde tên xwestin.

**Qamişlo/Brûc Resûl**

Remezan ji bo civaka Islamî meheke girînge û xwedî wateye, ji ber ku di vê mehê de misilman rojiyê digirin. Li bakur û rojhilatê Sûriyê di meha remezanê de hin xwarin û şerbet remezanî hene, ango tenê di vê mehê tên çêkirin. Wekî marok (Nanê şêrîn), şerbeta ava sûsê( Ereqsûs) û şerbeta xurmeyên hindê( Temirhindî). Ev xwarin û şerbetên remezanî jî bûne wekî kevneşopiyan li herêmê û hersal di meha remezanê de tên çêkirin. Herwiha ji aliyê gel ve ji bo xwarinê tên kirîn.
Derbarê xwarin û şerbetên Meha Remezanê yên bi taybet, herwiha awayên çêkirina wan firoşkarê Marûkan Qasim Sebrî û firoşkarê şerbeta Temirhidî Mihemed Emîn ji me re axivîn.

**Merûk nanê herî girînge ji bo Remzanê**

Qasim Sebrî diyar kir ku marok di meha remezanê de ji bo welatiyên bajarê Qamişlo pir girînge û wiha got: “Xwarina ku di remezanê de bûye wekî kevnerşopiyekê, marûke. Di heyva remezanê de welatî bi awayekî balkêş marokan dikirin. Çi ji sifreya remezanê kêm be dibe, lê bê marûk nabe. Bihayê



marûkan kêm û li gorî cûreyên şêraniyên din, erzan e û her kes dikare peyda bike. Herwiha xwedî sûde û enrjiyê dide laşê mirov.”





Sebrî da zanîn ku ew li kêleka marûkan tevahiya cûreyên şêraniyê çê dikin û wiha pê da çû: “Em seat 7’ê sibehê dest bi çêkirina hemû cureyên şêranînanê dikin, bi taybetî Merûk, ji ber ku Merûk nanê herî girînge ji bo Remzanê û pir tê xwestin. Gelek malbat hene nikarin cûreyên şêraniyan bi dest bixin , ji ber ku bihayê wan zêde ye, lê marok her kes Gelek kes ji bo kirîna wê diçin firinê û li gorî hijmare malbatê dibin, li gorî şîrîniyên din erzan e.”

**Awayê çêkirina marûkan**

Sebrî di derbarê çêkirina marûkan de wiha got: “Em Marûkê ji hevîr çêdikin herwiha li gorî pêwîstiyê ku tê xwestin şekir tevlî dikin, vanêliya û hevîrtiriş lê zêde dikin, piştî ku hevîr amade dibe, em dest bi çêkirina nanê şêranî û derbasî firinê dikin. Nêzî 20 xulikan dixin firina ku asta germahiya wê 250 C e, da ku bipêje, herwiha piştî ku amade dibe em şerbetê di rûyê marokan de didin û ji bo firotinê datînin ser maseyê.”
Qasim Sebrî balkişand ser bihayê marûkan û axaftina xwe wiha qedand: “Marûk li gorî îûraniyên din erzane, maroka mezin bi 7 hezaran tê firotin, ya navîn bi 5 hezar lîreye û ya bi çûk jî bi 3’ê hezar lîreye.”

**’Nifş bi nifş bû mîras’**

Firoşkarê bi navê Mihemed Emîn di derbaerê amadekirina vexwarinên remezanê yên kevneşopî de yên wekî Temir Hindî, Ereq Sûs, Celab wiha got: “Ez sala 1991’ê de li bajarê Helebê ji dayik bûme, di sala 2013’an de li bajarê Qamişlo bi cih bûm. Li ser vê bingihê, min û bavê xwe, ji bav û kalên xwe me karê çêkirina şerbetên remezanê girtiye. Min di 15’e saliya xwe de alîkariya bavê xwe di çêkirina şerbeta Temir Hindî,Ereq Sûs û Celab de dikir. Herwiha min li şûna bavê xwe bûm xwediyê bar, ji ber ku



ev kar di nav malbata me de nifş bi nifş bû mîras.”
Emîn diyar kir ku şerbetên Remezanê ji bo mirovan bûne wekî kevneşopiyekê û wiha domand: “Di meha Remezanê de em van şerbetan li ser basta difroşin, herwiha ji ber ku di vê mehê de temer Hindî,Ereq Sûs,Celab bûne wekî kevneşopiyekê, ji aliyê piraniya welatiyan ve zêde tên xwestin.”
Emîn derbarê awayê amadekirina şerbetên remezanê de wiha got: “Em ji bajarê Reqayê a herêma Firatê , Ereq Sûs,Temir Hindî û Celab tînin. Ji bo çêkirina Ereq Sûsê, ew hurkirî û ameda ji mere tê, paşê tê zuhakirin, bi karbonat û avê tê çêkirin. Herwiha em Temir Hindî xav ji bazaran dikirin û bi şev dixin di nava ava kelandî de, heta ku were helandin û bi avê re bive têkel, roja din tê kelandin û li gorî pêwîstiyê şekir lê tê zêdekirin û ji bo vexwarinê amade dibe. Şerbeta Celab jî, em ji madeya lîmonê, şekir û avê amade dikin.

# Li Balekayetî gundek 500 salî ji ber nebûna xizmetguzariyan vala dibe

**Gundê Gezneyî ku dîroka wê digihe zêdetirî 500 salan û gundê herî kevin ê devera Balekayetiye, lê heta niha ji xizmetguzariyên sereke bê par hatiye hiştin. Ji ber bêkarî, nebûna xizmetguzariyan her ku diçe gund vala dibe.**

Gundê Gezneyî girêdayî bajaroka Simêlan a ser bi navçeya Çoman a girêdayî parêzgeha Hewlêrê ye. Wek gundê herî kevin ê devera Balekayetî tê hesibandin. Heta niha jî avahiyên gund bi şêwazê kevin maye û sîmayek xweşik yê gund heye.
Dîrok û şêwazê kevin yê avahiyên gundê Gezneyî bala geştiyaran dikêşe ser xwe. Kesên serdana gund dikin, li ber avahî û xwezaya xweşik ya gund wêne û dîmenên xwe digrin. Lê ev gund hatiye paşguhkirin û bi qasî tê xwestin xizmetguzarî jêre nehatine kirin.
Reşîd Ehmed yek ji şêniyên gundê Gezney e, ji Rojnews re axivî û got: “Dîrokek gelek kevnar a gundê me heye ku dîroka wê digihe zêdetirî 500 salan. Gundê me yek ji gundên herî kevnar ên devera Balekayeti-



ye. Ji xaniyên wan diyare ku heta niha jî wek xwe mane.”
Derbarê xizmetguzariyan de jî



Reşîd Ehmed diyarkir gundê wan ji piraniya şoreşên Kurdan re xizmet kiriye û ji ber vê xizmeta xwe jî gelek caran rastî êrîşan hatiye û xelkê wê koçber bûne. Reşîd got: “Lê niha Hikûmeta Herêma Kurdistanê ti xizmetek ji gundê me re nekiriye, rê û cadeyên me xirabin, nebûna xizmetguzariyan dibe sedem gund vala bibe.”

Jina bi temen a bi navê Qedriye Mistefa jî li ser dîroka gund got: “Heta niha heft nifş li pey hev li vî gundî jiyan kirine û em nifşê heştemînin. Yanî zêdetirî 500 salin ev gund avaye. Xelkê gundê me hemû xizmên hevin. Peywendiyek xurt a civakî di navbera me de heye, vê peywendiya xurt wisan



kiriye ku jiyana gund xweştir bibe.

Derbarê şêwazê karkirina li gund de Qedriye got: “Berê hemû karên li gund bi awayê zibare (komînal) dihatin kirin. Xaniyên ku heta niha li gund mane jî bi awayê zibare hatine çêkirin. Lê mixabin ev şêwazê karkirinê niha gelek kêm û lewaz bûye.”

welatiyê bi navê Mihacir Hesen jî derbarê kar û jiyana rojane ya li gundê Gezneyî axivî. Mihacir got: “Destpêkê zêdetirî 200 mal li vî gundî hebûn. Lê niha nêzî 50 mal lê mane. Sedemê valebûna gund ji ber xemsariya hikûmetê, nebûna xizmetguzarî û giringî pê nedana kerta çandinî û sewalvaniyê ye.”

Mihacir Hesen diyarkir xaka gundê wan ji bo çandiniyê gelek başe



û çavkaniyên ava wê jî ji kanî û robaran tê. Mihacir got: “Ji ber van sedeman piraniya xelkê gund bi karê çandinî û sewalvaniyê re mijulin. Lê ji ber berhemên me nayên firotin, her ku diçe gund ber bi valebûnê ve diçe.”

Li gor gotina şêniyên gund, xaniyên gund li ser şêwazê xwe yê kevin mane û vê yekê jî wisan kiriye ku sîmayek ciwan yê gund derkeve pêş. Xwezaya xweşik û şêwazê xaniyên kevin ên gund jî bala geştiyaran dikêşe li ser xwe.

Gundê Gezneyî girêdayî bajaroka Simêlan a ser bi navçeya Çoman a girêdayî parêzgeha Hewlêrê ye. 130 kîlometreyan dikeve bakurê Hewlêrê. Her wiha dikeve rojavayê Çiyayê Helgurd û qontara Çiyayê Goşîne. **ROJNEWS**



# PKK: Em ê teqez xwedî li armancê fermandarê mezin Fazil derkevin

**Navenda nûçeyan**

**Komîteya Navendî ya PKK’ê şehadeta fermandarê mezin Fazil Botan ragehand û got, em soz didin ku em ê teqez xwedî li armancên Fermandarê mezin Fazil derkevin**

PKK’ê ragihand ku yek ji pêşengên tevgera azadiyê û têkoşîna gerîla Fazil Botan şehîd bûye. PKK’ê got, “Wê weke hevrêyekî welê bê bîranîn ku her şaneya xwe tevlî rastiya Rêbertî, têkoşînê, şerê gerîla û PKK’ê kiriye.”
Komîteya Navendî ya PKK’ê ji ber şehadeta Fazil Botan peyamek weşand.
PKK’ê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku hêzên wan bi lehengî li ber xwe didin û wiha got: “PKK partiyeke Rêbertî û şehîdan e, li dijî dijminê kujer, faşîst, qirker û zalim têkoşîneke mezin dide. Li hemberî êrîşên dewleta Tirk a faşîst ku bi çek û teknîka herî pêşketî dike, li gel êrîşên dijmin ên bi gazên bi jehr û çekên kîmyewî yên di asta navneteweyî de qedexe ne, artêşa gerîla bi lehengî li ber xwe dide. Dost û dijmin, her wiha dîktator Erdogan-Bahçelî û faşîzma AKP-MHP’ê jî baş zanin ku serketina misoger a artêşa gerîla gelekî nêzîk e. Lewma diperpitin û mîna ku har bûne, êrîş dikin.”
PKK’ê da xuyakirin ku Şehîdê mezin ê partiya wan Fazil Botan wê weke hevrêyekî welê bê bîranîn ku piştî tevlî nava refên partiya wan bû her şaneya xwe tevlî nava rastiya Rêbertî, têkoşînê, şerê gerîla û partiya wan kir û wiha domand: “Weke fermandarê efsanewî yê berpirsyarî û wezîfeya mezin, meş



û tevlîbûna mezin, di pêşvebirina artêşa gerîla de bi roleke mezin rabû. Ji dema ku tevlî nava partiya me bû û pê ve pêşketinên mezin afirand û hema bêje li her bihosta xaka Kurdsitanê gerîlatî kir, bi taktîkeke bêhempa ya gerîlatiyê derbên giran li dijmin xist. Bû yek ji fermandarên bijarte. Ji bo dawî li zext û koletiyê bîne, ku bi sedan sal in li ser gelê Kurd û gelên Rojhilata Navîn tê ferzkirin, bi dil û can, bêrawestan têkoşiya.”
Komîteya Navendî ya PKK’ê domand: “Partiya me ku ji 21’ê Adarê roja çalakiya fedaî ya mezin a Hawayê Hemdem hevrê Mazlûm Dogan û heta 28’ê Adarê roja şehadeta fermandarê gerîla yê mezin hevrê Mahsûm Korkmaz weke Hefteya Lehengiyê pîroz dike, şehadeta fermandarê mezin û endamê Komîteya Navendî ya partiya me hevrê Fazil Botan radigihîne, di heman demê de soz didin ku em ê teqez xwedî li armancên wî derkevin. Em careke din dibêjin ku sond rûmet e, em ê ti carî rûmetê binpê nekin. Li gorî soza xwe ku me gotibû em ê bibin şûrê tolhildanê yê tûj ê Mazlûm Dogan, Mahsûm Korkmaz, hevrê Fazil û hemû şehîdên me yên din, em ê vê soza xwe bi cih bînin, em careke din vê sozê didin gelê xwe û gelên cîhanê.”

# Zanîngeha Rojava Newroza 2023’an pîroz kir

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Xwendekar û mamosteyên Zanîngeha Rojava bi diruşmeya ‘Her der Newroz, her dem azadî’ bi şahiyek Newroza 2023’an pîroz kirin.**

Li navenda Zanîngeha Rojava, Fakulteya Wêje û Zanistên Civakî ya li taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo, bi amadebûna mamost, xwendekar û şêneyên bajarê Qamişlo, şahiya Newrozê hat li darxistin. Herwiha bi diruşmeya ‘Her der Newroz, her dem Azadî ye’ Newroz hat pîrozkirin.
Zanîngeha Rojava di destpêka bernameya xwe ya pîrozbahiyê de bixêrhatina kesên amadebûne kir, herwiha deqeyekê li ser giyanê hemû pakrewanên Kurdistanê hat





rawestandin û piştre agirê Newrozê hat dadan.
Piştî dadana agirê Newrozê, li ser navê Zanîngeha Rojava Şînda Dawûd axaftî û Newroza 2023’an li Rêber Apo û hemû gelê kurd pîroz kir.
Piştî wê jî lêkolîner, nivîskar û helbestvan Salihê Seydo û helbestvan Dilyar Hebîb Newroz pîroz kirin û çend helbest xwe xwendin.
Di vê çarçovê de jî mamosteyê wêjeya Erebî, Fîras Setam helbesteke bi zimanê Erebî pêşkêş kir.
Piştî wê koma Kevana Zêrîn Sitranê Şoreşgerî pêşkêş kir. Ji Çand û Hunera bajarê Qamişlo jî hunermend Danîş Botan çend stran pêşkêş kirin. Herwiha hunermen û stranbêjê Efrînî Ecîb Efrînî sitranek pêş kir.
Di dawî de kesên beşdar, xwendekar, mamoste û şêneyan re, ser dengê hunermend û sitranbêj Ismaîl Yûsiv,bi coşeke mezin govendeke Kurmancî gerandin.

# Saziyên sivîl: Divê komîteyeke lêpirsînê here herêmên dagirkirî

**Rêxistina Mafên Mirovan a Herêma Cizîrê, Yekitiya Parêzeran a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê û Nivîsgeha Kombûna Jinan a Zenûbiyayê ya Reqayê bang kir ku komîteyeke lêpirsînê ya serbixwe biçe herêmên dagirkirî yên bakurê Sûriyeyê û hesab ji berpirsên komkujiya Cindirêsê û hemû sûcên ji destpêka dagirkirina Efrînê ve, bipirsin.**

Rêxistina Mafên Mirovan a Herêma Cizîrê û Yekitiya Parêzeran a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi daxuyaniyeke hevbeş komkujiya Cindirêsê şermezar kir.




Hevserokê Yekitiya Parêzeran a Herêma Cizîrê Ciwan Mihemed daxuyanî li pêşiya avahiya Komîseriya Bilind a Kar û Barên Penaberan a NY`yê ya Taxa Siyasî ya Qamişloyê xwend. Endamên rêxistinê, yekitiyê, nûnerên Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) tev li dayîna daxuyaniyê bûn.
Di daxuyaniyê de hat destnîşankirin ku dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê sûcên hovane li dijî mafên mirovan û peymanên navneteweyî pêk tînin.
Her wiha hat diyarkirin ku piştî komkujiya li Cindirêsê li dijî Kurdan pêk hatiye ku di encamê de 4 welatî ji heman malbatê şehîd bûn û 3 din jî birîndar bûn, xwepêşandan li dar ketin û banga bi dawîkirina nîjadperestiya li dijî wan pêk tê û derxistina komên çeteyan hat kirin.
Di daxuyaniyê de bang li NY`yê hat kirin ku tedbîr pêwîst bigire ji bo niştecihên resen ên li Efrînê biparêzin û fişarê li Tirkiye bike da ku dagirkeriyê bi dawî bike, berpirsyariyên xwe yên qanûnî wek dewleteke dagirker bîne cih, ewlehiyê misoger bike, hesabê ji pêkanînerên vê sûcê bipirse û hemû sûcên ku heta roja îro tên kirin, rawestîne.
Her wiha bang hat kirin komîteyeke lêpirsînê ya serbixwe ya navneteweyî bişînin herêmên dagirkirî yên bakurê Sûriyeyê ji bo ku rewşa mirovî û mafên mirovan li wan herêman nas bike, mudaxele bike û sûcên tên kirin rawestîne, sûcdaran û piştevanên wan li dadgehên navneteweyî darizîne û piştgiriyê ji niştecihên resen re pêşkêş bike. **ANHA**

# Besê Hozat: Dînamîka demokrasiya bingehîn Tifaqa Ked û Azadiyê ye

**Navenda Nûçeyan**

**Besê Hozat diyar kir ku Tirkiye rastî pêvajoyeke hilbijartinê ya dîrokî hatiye û got, di vê pêvajoya têkoşînê de rola Tifaqa Ked û Azadiyê bi taybetî di vê pêvajoya hilbijartinê de pir girîng e. Ev tifaq wê ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê jî roleke diyarker bilîze.**

Hevseroka Konseya Rêveber a KCK'ê Besê Hozat di bernameyeke taybet a televîzyona Medya Haberê de axivî û di beşek ji naxaftina xwe de Newroza 2023'an û hilbijartinên Tirkiyê Nirxand.

**'Newroza 2023'an Newroza Rêbertî bû'**

Besê Hozat diyar kir ku Newroza 2023'an bi temamî bû Newroza Rêber Apo û wioha got: "Azadiya fîzîkî ya Rêbertî mohra xwe li Newrozê xist. Li Bakur li metropolên Tirkiyeyê, li gelek bajarên Tirkiyeyê Newroz hate pîrozkirin. Li Anatoliya Navîn, li Çanakkaleyê li gelek deveran pîrozbahiyên gelekî bi wate yên Newrozê çêbûn. li Rojava gelekî bi heybet bûn. Li Rojhilat, li Başûr û bi rastî jî li her devera cîhanê bi heybet bûn. Di hemûyan de jî azadiya fîzîkî ya Rêbertî mohra xwe li Newrozê xist. Lewma Newroza îsal bû Newroza Rêbertî. Gelê me ji bo azadiya fîzîkî ya Rêbertî îradeyeke hîn xurt nîşan da.Têkoşîna ku bi salane dewam dike bi Newrozê re gihîşt asta herî bilind. Newroz bû Newrozeke Rêbertî. Ji xwe Rêberê Newrozê Rêber Apo ye. Yê ku Newroz ewqasî bi wate kir, veguheran Newroza berxwedanê, têkoşîna tevgera Apoyî ya bi pêşengiya Rêber Apo bû. Lewma rastiya gelekî yê Newrozê hate afirandin.

**'Bi paadîgmeya Rêber Apo me civaka cîhanê, gel û jin gihandin hev'**

Besê Hozat divê ew paradîgmaya Rêber Apo li nava civakê belav bikin û wiha domand: " Paradîgmaya Rêbertî belav bû, bi paradîgmaya Rêbertî re me civaka cîhanê, gel û jin gihandin hev. Xwedîderketineke hîn xurtir li Rêbertî derdikeve holê. Rêbertî hîn baştir tê fêhmkirin. Xizmetên ku Rêbertî ji mirovahiyê re dike baştir têne dîtin. Mirovahî, gel û civak hîn bi xurtî xwedî li Rêbertî derdikevin, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêbertî têkoşînê dimeşînin. Bi rengê herî xurt tevlî têkoşîna Kurdan dibin. Lewma divê em paradîgmayê bi rê û rêbazên cuda hîn bêhtir li nava civakê, mirovahiyê belav bikin, bidin naskirin."

**'Helwsta ereban girîng bû'**

Besê Hozat da zanîn ku di Newroza 2023'an de helwesta Ereban jî gelekî girîng bû û wiha got: "Li gelek bajarên Ereb, li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li gelek qadan Ereban daxwaza azadiya Rêber Apo kirin. Tevî Kurdan Newroz silav kirin. Îradeya rizgarkirina qadên dagirkirî ji bin dagirkeriya dewleta Tirk nîşan dan. Ev gelekî girîng bû. Li ser vê bingehê peyameke gelekî girîng bû. Mîna ku min got, divê em îradeya di Newrozê de hate nîşandan ji niha û pê ve bikin îradeya berxwedan û têkoşîneke hîn xurtir û azadiya fîzîkî ya Rêber Apo teqez misoger bikin. Vê Newrozê helwest û îradeya vê yekê destnîşan kir."

**'Em ê desthilata qirker hilweşînin'**

Besê Hozat da zanîn ku Newroz ji bo Kurdan berxwedaneke azadiyê ye û wiha domand: " Newroz berxwedan , raperîn e û serhildan e. Li dijî zilm û zaliman ji Kawayê Hesinkar heta niha ev Newroz bi vî rengî hatiye pîrozkirin. Dehaq ê vê serdemê, zalimê vê demê rejîma AKP-MHP'ê ya faşîst e. Newroz jî li dijî rejîma AKP-MHP'ê li hemberî desthilatdariya faşîs û qirker helwesteke xurt, serhildaneke xurt nîşan da. Ev gelekî bi wate ye. Ji aliyekî ve helwesta hilweşandina vê desthilatdariya faşîst nîşan da, pêvajoyeke bi vî rengî da destpêkirin. Di vê Newrozê de di vê mijarê de îradeyeke xurt hate nîşandan. Got, em ê vê desthilatdariya faşîst, em ê desthilatdariya faşîst qirker hilweşînin."

**'Biryara rawestandina çalakiyan wê heta hilbijartinan dewam bike'**

Besê Hozat ragehand ku biryara rawestandina çalakiyan wê heta hilbijartinê dewam bike û wiha got: "Di rewşa heyî de Tirkiye ketiye nava pêvajoyeke gelekî girîng. Pêvajoyeke hilbijartinê ye. Ev pêvajoya hilbijartinê ji bo civaka Tirkiyeyê, ji bo civaka Kurd gelekî girîng e. Bi rastî jî naşibe hilbijartinên beriya niha. Wateyeke xwe ya dîrokî heye. Têkoşîna me ev desthilatdariya faşîst xistiye pêvajoya hilweşînê. Ketiye pêvajoya hilweşînê. Pêvajoya hilbijartinê jî parçeyek ji vê yekê ye. Bi vê pêvajoya hilbijartinê re eger têkoşîneke xurt bê meşandin, têkoşîn bê mezinkirin ev desthilatdariya faşîst wê 14'ê Gulanê hilweşe. Lewma biryara me ya rawestandina çalakiyan wê di pêvajoya hilbijartinê de dewam bike. Piştî hilbijartinê em ê rewşê ji nû ve binirxînin û nêzîkatiya xwe bi raya giştî re parve bikin.

**'Dînamîka demokrasiya bingehîn Tifaqa KED û Azadiyê ye'**

Besê Hozat diyar kir ku Tirkiye rastî pêvajoyeke hilbijartinê ya dîrokî hatiye û wiha got: "Ev hilbijartin girîng e, ev pêvajo ji hilbijartinê wêdetir xwedî wateyekê ye. Ji ber ku encama têkoşîna salan, têkoşîna civakî, têkoşîna gerîla, têkoşîna siyaseta demokratîk e. Vê desthilatdariya qirker a faşîst anî asta hilweşandinê. Ev hilbijartin di vê wateyê de girîng e. Wê qonaxekê ava bike. Yanî di vê pêvajoya têkoşînê de rola Tifaqa Ked û Azadiyê bi taybetî di vê pêvajoya hilbijartinê de pir girîng e. Ev tifaq wê ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê jî roleke diyarker bilîze. Rola vê tifaqê di avakirina komara demokratîk de gelek diyarker e. Divê ev tişt wisa were dîtin. Ji ber ku hêza bingehîn a demokratîk û dînamîka demokrasiya bingehîn a li Tirkiyeyê pêkhateyên vê tifaqê ne. Ew beşa civakî ye ya ku li ser hatiye avakirin. Kevneşopiya berxwedanê ye. Ev tifaq çiqas xurt bibe, berfireh bibe, çiqasî bandorê li civaka Tirkiyeyê bike wê hevgirtin, helwesteke xurt, bijardeya demokrasiyê ya li Tirkiyeyê jî xurttir bibe. Wê demokrasî xurttir dibe."



**'Muxatebê pirsgirêka Kurd Rêber Apo ye'**

Besê Hozat da zanîn ku Pirsgirêka Kurd tenê li parlamentoyê çareser nabe û wiha domand: "Ev pirsgirêke piralî ye. Bûye pirsgirêkeke herêmî. Ev pirsgirêk xwedî gelek aliyan e. Gelek aktorên wê hene. Gelek pêkhateyên wê hene. Di serî de helbet îradeya çareseriya vê pirsgirêkê, muxatabê çareseriyê, muxatabê sereke jî bêguman Rêber Apo ye. Pirsgirêka Kurd pirsgirêkek kûr e. Pirsgirêkek bi kok e. Bêyî ku ev heqîqet û rastî bê dîtin, ev pirsgirêk tenê bi nêzîkatiyek seranser, xapandin, tenê bi plana girtina dengê Kurdan û propagandayê nayê çareserkirin. Ev feraset rê li ber têgihiştineke nû ya klasîk a dewletê, bi zîhniyeta wê, bi restorekirina wê ve dibe. Divê tu hêz qet nekeve nav vê."

## ÇIMA SEMBOLÊN PDK'Ê LI EFRÎNÊ LIBA DIKIN?



**DILYAR CIZÎRÎ**

Di roja 20'ê Adarê de û dema hejmara kêm mane ji welatiyên kurd li Cindêrisa Efrînê ku hîn di bin bandora birîna kûr a erdheja 6'ê sibatê de bûn, bi coşa Newrozê şad dibûn û agirê Newrozê pê dixistin, çeteyên dewleta Tirk a dagirker xwe li şahiya Efrîniyên resen ranegirtin û welatî gule baran kirin. Di encamê de 4 kesên ji heman malbatê şehîd bûn û hin welatî birîndar bûn. Paşê hate gotin hejmara şehîdan derket 5'an.
Piştî komkujiyê gelê kurd bi rihê berxwedana Newrozê li dijî zulim û zordariya dewleta Tirk û çeteyên wê ya 5 salan serî hildan. Saet li pey saetê xwepêşandan li herêmên kantona Efrînê zêde bûn. Gihişt asta mijar di rojeva cîhanê cih bigre. Dewleta Tirk a ku Efrîn dagirkir û çete tê de bi cih kirine, ji bo bûyer zêdetir nebe rojev û ji destê wan dernekeve bi rêbazên xwe yên qirêj destwerdan kirin.
Di vir de rê ji alîgirên ENKS'ê û hevalbendên wan re hate vekirin, ala herêma Başûrê Kurdistanê bi rehetî li Cindêrisê rakin. Her kes dizane ev 5 salin rê li wan jî dihate girtin. Lê vê care hevalbendên ENKS'ê xwe kirin wekî serkêşê xwepêşandaran. Lê mixabin li şûna bi rastî serkêşiyê bikin û riwê rast ê bûyerê aşkere bikin. Bûyer wekî çend kesan û komekê pêk aniye, anîn ziman. Heman tişt di ragihandinên girêdayî opozisyonê, dewleta Tirk û PDK'ê de jî hate nîşandan. Bi vê jî kujerên rast ku dewleta Tirk û siyasetên wê yên dagirkeriyê ye veşartin. Kujer wekî komeke ji çend kesan nîşan dan.

Heger helwesta wan rast bi armanca darizandina kujeran ba, wê destpêkê pergala dagirkeriyê ya dewleta Tirk û çeteyên wê mehkûm kiribana. Wê bûyer berûvajî ne kiribana. Wê çareseriya wê jî bi rizgarkirina Efrînê û dawîkirina pergala dagirkeriyê nîşan dabana. Di vir de jî mirov niyeta beşdarbûna ENKS'ê ya di nava xwepêşandana de zelal dibîne.
Yenî di rastiya xwe de mijara komkujiya Newrozê ya li Cindirêsê xalek ji siyasetên dewleta Tirk a dagrker ku 5 sal in li ber çavên cîhanê pêk têne. Mane wan Efrîn dagirkirin welatiyên Efrînê ji cih û warên xwe wan derxistin û guhertina demografî li wir û hemû cihên din ên dagirkirine pêk tînin.
JI bo wê divê gelê kurd bi diruşmeyên wan û rakirina alên herêmê neyên xapandin. Carde jî dibêjim heger helwesta ENKS'ê ne planek qirêj baya Wê di cih de xwe ji Koalîsyona Opozisyonê (Itîlaf) bikşandaya. Wê mijar bi pergala dagirkeriyê de girêdabaya. Wê çareserî jî ne bi darizandin û girtina çend çeteyan ve girêdaba. Ji ber çareseriya rast darizandina dewleta Tirk a dagirker e û bi dawîkirina pergala dagirkeriyê ye. Heger wiha nebe û dawî li guhertina demografî neyê, Efrîniyên li kampên koçberiyê li Şehba û deverên din jiyan dikin, venegerin ser warê xwe, wê tola şehîdên Newrozê û şehîdên komkujî û wêrankirina dewleta Tirk û çeteyên wê di van 5 salan de pêk anîne neyê hilanîn.



# 'Serhildana ku Jîna Emînî dest pê kir, em ê dewam bkin'

Xwendekar û mamosteyên jin yên Zanîngeha Rojava, tundiya li dijî serhildana jinan ya li Rojhilatê Kurdistan û Îranê şermezar kirin û gotin, Serhildana ku Jîna Emînî dest pê kir em ê berdewam bikin.

**Hemze Sêvo/Qamişlo**

Bi henceta ku tayên ji pora wê di bi hêcabê de derketine, di 13`ê îlûna 2022`yan de, keça kurd ya 22 salî Jîna Amînî ji aliyê polîsên Exlaq yên Îranê ve hat işkencekirin, piştê bi sê rojan, ango di 16' îlona 2022'an de Jîna Emînî li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest da. Ji ber kuûştina JÎna Amînî jinên Kurdistan û Îranê jî li heber Rêjîma Îranê û zordestiya wê derketin kolanan,bi durişmeya Jin,Jiyan,azadî dest bi serhildanê kirin, di encamê de serhildana Jinan li Îranê û tevahiya cîhanê dengveda û belav bû.
Rêjîma Îranê wekî her car li hemberî serhildana jinan bêdeng nema, her ku serhildan firehtir bû, rêjîmî jî kuştin , girtin, revandin û işkencekirin zêdetir kir. Lê tevî ku rêjîma îranê tevahioya kiryarên dijmirovî li hemberî serhildana kir jî, lê heta Îro serhildana gel bê navber dewam dike.
Di encama şideta rêjîma Îranê gelek kesan jiyana xwe ji dest dan, li gorî rapora Rêxistina Mafê Mirovan a Îranê 488 kes li ser destê rêjîma Îranê hatine qrtilkirin, ku ji wan 66 jin û 64 zarok in. Li kêleka işkence û kuştinê jî, rêjîmê gelek kes binçav kirin. Li gorî raporên ku hatine eşkerekirin, hejamara girtiyan heya niha gihaşt 3 hezaz û 953 kesan, ji wan 120 xwendekarên jin in.
Rêjîma Îranê ji bo ku serhildanan bişkîne, serî li her rêbazî da. Herî dawiyê bi gazên jehrî êrîşî dibistanan keçan kir û di encamê de 7 hezar û 68 xwendekarên keç ji bo tedawiyê ji bo nexweşxaneyan hatine rakirin.





Derbarê serhildana 'Jin Jiyan Azadî' ya li Rojhiêlatê Kurdistan û Îranê, xwendekar û mamosteyên jin yên Zanîngeha Rojava ji me re axivîn.

**'Serhildana 'Jin,Jiyan,Azadî' bû serhildaneke navnetewî'**

Mamosteya beşa jinolojî ya zanîngeha Rojava Xelat Xelîl diyar kir ku sehildana gel li Rojhiltaê Kursdistan û Îranê di demeke kurt de li cîhanê deng veda û wqiha domand: "Serhildana jinan a ku li dijî kuştina keça kurd Jîna Emînî di 16'ê Îlûna 2022'an de dest pê kiribû, di demeke kurt de li tevahiya cîhanê deng veda û belav bû. Jîna Emînî bi hinceta ku pora xwe nenixumandiye hat işkencekiein û kuştin. Gelê Rojhilêatê Kurdistan û Îranê , li hemberî vê zilmê serî rakirin, banga têkbirina Rêjîma Îranê ya zordest kirin. Ev serhildan bi demê re û bilez li tevahiya cîhanê hat naskirin û deng veda, gelek jinên cîhanê jî piştgiriya serhildana 'jin Jiyan Azadî' kirin û kiryarên rîjîma Îranê şermezar kirin. Em dikarin bêjin ku serhildana Jinan li Rojhilatê Kurdistan bû serhildana jinan ya cîhanî."

**' Serhildana Jin,Jiyan,Azadî bû dengê jinên azadîxwaz'**


Xelat Xelîl diyar kir ku şoreşa jinê ya Rojhilatê Kurdistan û Îranê bû dengê jinên azadîxwaz yên cîhanê û axaftina xwe wiha qedand: "Beriya serhildana 'Jin Jiyan Azadî' li cem jinên Rojhilata Navî, bi taybet jinên welatên mislmanan tirsek hebû. Mînaka wê jî, beriya serhildana jinan ya Rojhilat, eger jinê pora xwe derxista diohat cezakirin û carinan dihat darvekirin, MÎNAKA Wê Jî Zeyneb Celaliyan û Jîna Emînî ne. Lê îro jin li hemberî rêjîmê li kolanan serî hildaye. Piştî serhildana ku bi rihê berxwedana Jîna Emînî û silogana Jin,Jiyan,Azadî derket holê , êdî jinên Rojhilatê Kurdistan û Îranê bêtirs daketin kolanan, hicaba serê xwe avêtin û şewtandin.Herwiha ne tenê ev yek pêngaveke gelekî mezin bû ku jinê bi vîn û berxwediya xwe ku pêşxistineke fikrî berbiçav bi xwe re çêkir."



**'Beşa Jjinolojî piştgriyê dide jinên azadîxwaz '**

Xwndekara Zanîngeha Rojava Aya Salih jî ku beşa Jinolojî diwxîne diyar kir ku jinên Rojavayê Kurdistanê û bakur û rojhilatê Sûriyê bi tevahiya hêza xwe piştgiriya serhildana jinan li Rojhilatê Kurdistan û Îranê dikin û wiha got: " Jinolojî ew zanista ku Rêber Apo derxistiye ji bo parastina mafê jinê, bidestxistina azadiya jinê û pêşxistina fikrê wê ji hemû aliyan ve. Em jî weke beşa Jinolojî ya zanîngeha Rojava û jinên Rojavayê Kurdistanê û bakur û rojhilatê Sûriyê, tundiya ku li ser jinên Rojhilatê Kurdistan û Îranê tê kirin şermezar dikin û piştgriyê didin wan, herwiha ji bo hemû Jinên Kurdistan û cîhanê yên ku di bin zilm û zordestiya baviksalriyê de ne, ji bo azadiya wan em hertim destikdayînê didin wan û ji bo bidestxistina mafên wan emê herdem piştgriyê didin wan û têkoşînê berdewam dikin."

## Nêzîkbûna Erebîstana Si'ûdî û Sûriyê



**Zekî BEDRAN**

Erebîstana Si'ûdî ragihand ku wan têkiliyên xwe yên bi hikumeta Sûriyê re asayî kirin û biryar dane ku balyozxaneyên xwe vekin.
Beriya niha jî bi hewldanên Çînê, Sûdiyê ragihand ku wan biryar daye bi Îranê re hevdîtinan çêbikin û têkiliyên xwe yên bi Îranê re pêş bixin. DYE yê jî diyar kir ku ew li dijî asayîbûna têkiliyan a bi Sûriyê re ne. Li gel vê jî tu guherin bi helwesta Sûdî re çênebû. Si'ûdiyê demek dirêj bi Îranê re ketibûn qirika hev. Taybet di şerê li Yemenê de ketibûn çeperên dijber. Di demeke ku Çîn û DYE yê xwe li hev radikişandin de, nêzbûna Si'ûdî ya bi Çînê re balkêş e û girînge ku li ser bê nîqaşkirin.

DYE demekê ji bo asayîkirina têkiliyên welatên Ereban û Îsraîlê gelek hewl da. Encam ji van hewldanan jî girt. Piraniya welatên Ereban bi Îsraîlê re hevdîtin û lihevkirin çêkirin. Armanca DYE yê ew bû ku Îsraîlê ji tenêbûn û tecrîda li herêmê rizgar bike û biparêz e. Îsraîl, ji derveyî Îranê di aliyê welatên din de rihet bû. Hem di hindir de hem jî li Sûriyê li Îranê xist, hewl da bandora wê ya li herêmê lewaz bike. Carnan DYE û Îran jî li dijî hev êrişên vekirî û veşartî pêk tînin. .
Îran û DYE axa Sûriyê weke qada pevçûnan bikar tînin. Rûsya, ji bo bêzarkirin û derxistina DYE yê ji Sûriyê çi ji destê wî tê dike. Di vî alî de piştgiriya Îranê dike. Li aliyek din jî naxwaze Îran li Sûriyê pir bi bandor bibe. Bi hikumeta Şamê re lihevkirinên stratejîk ên demdirêj çêkiriye. Dixwaze li Sûriyê mayînde bibe û bandora xwe zêdetir bike.
Ji aliyekî ve bi Îranê re di nava hevrikiyê de ye, li aliyê din naxwaze bi Îranê re bê beranberî hev. Têkiliyên Îranê bi Şamê re kevin in. Ji bo rejîma Beşar li ser lingan bimîne alîkariyek mezin da. Rûsyayê di aliyekî de jî bi Îsraîlê re gelek hevdîtin çêkirin. Tê dîtin ku bi wan re di gelek mijaran de lihev kirine. Îsraîl li ser hev li Şamê û bajarên din dide. Beşek girîng ên xalên tên hedefgirtin girêdayî îraniyan in. Rûsya piranî li hemberî van êrişan bêdeng dimîne. Pergala parastina hewayî naxe dewrê. Tê pejirandin ku di vê mijarê de bi Îsraîlê re li hev kiriye. Si'ûdî di nava van nakokî û pevçûnan de piranî li gorî DYE yê tevger kir. Cih di koalîsyona li hember DAIŞ'ê de girt. Beşdarî xebatên bitenêhiştin û guherîna rêveberiya Şamê bû. Li Sûriyê hêzên çekdarî jî di nav de, gelek piştgiriyên cidî da muxalîfan. Li gel van jî rêveberiya Beşar li ser lingan ma. Niha jî dibêje tu sûda tecrîdkirina Sûriyê tune ye. Têkiliyên bi şamê re pêş dixe. Pêşxistina têkiliyên fermî û vekirî bi Şamê re bêguman bi wan re sînordar namîne. Welatên wke Yekîtiya Emîrên Ereban û Qeter ji xwe dest bi hewldanan kirine. B. Esad dest bi gera li welatên Ereban kiriye.
Si'ûdî li rûxma DYE yê van têkiliyan pêş dixe. Ma em dikarin bêjin dikeve nava lêgerînên cuda? Ev pirsek girîng e. Ma dikare ji bo ewlehiya xwe tenê pişta xwe bide DYE yê? Dibe ku ji ber ketine ferqa vê li alternatîfên cuda digere? Ku Si'ûdî hewl da bi tevahî hêzên li dijî Îranê û bi Îranê re ketibûn nava şer re têkiliyan çêbike û bi piştgiriyê cesaret da wan. Di vê rêyê de tişta ku armancdikir bidest nexist. Dît ku Îranê bi hêsanî bes nake. Ji derveyî vê niha ji derveyî Îranê tu hêzên ku gefê li Si'ûdî dixwe tune ye. Îran li Rojhilata Navîn navendek a hêzê ye. Desthilat û rejîm hewl dide ewlehiya xwe ya derveyî sînor biparêz e. Ji bo vê çavkaniyên mezin embar dike. Li herêmê dikare hinekan bibîne ku ji wî re şer bikin. Li herêmê Îsraîlê weke hedef dide nîşan, bandorê li tevahî gelên herêmê dike û di nava Ereban de piştgiriyek cidî digre. Bîrdozî û rejîma ku Îranê çêkiriye, hertim li dijî Îsraîl û DYE yê di nava seknekê de ye. Îranê di vê mijarê de zext li welatên Korfezê û Sûûdiyan kir. Ew jî ji bo parastina desthilata xwe li derdora DYE yê kom bûn. Lê pêşketinên ku di salên dawî de li herêmê çêbûn, ew ber bi lêgerînên nû ve birin. Dîtin ku DYE li gorî ew dixwazin wan naparêz e. Ji derveyî wê dîtin ku kesek weke Erdogan endamê NATO'yê, ji NATO' yê zêdetir bi Rûsyayê re têkilî çêkirin û ji vê sûd girt. Temaşe kirin ku NATO û DYE yê tu helwestek cidî nîşanî Erdogan nekirin. Hinek jî ji vê bandor bûn, hevdîtin bi Çînê re çêkirin û gavên asayîbûnê bi Îranê re avêtin. Îran DYE yê jî diceribîne. Şereke vekirî îlan nake, lê li vir li wir bi dron û fûzeyan DYE yê bêzar dike. Hewl dide nîqaşekî di nava DYE yê de ava bike. DYE di rewşa heyî de, li Rojhilata Navîn şerekî bi Îranê re naxwaze. Çawa ku DYE hewl dide Îsraîlê bi welatên Ereban re bîne gel hev û biparêz e, Îran jî hewl dide ewlehiyan xwe ya li herêmê çêbike û qada tevgera xwe fireh bike. Di vî alî de dê gavên asayîbûna Si'ûdî bi Sûriyê re û hevdîtinên bi Îranê re hevsengiyên li herêmê bandor bike.